

ROJA NÛ

Kiriyariya Roja Nû; ji bona erdê Sûriye û Libanê; 10 lîreyên Sûrî; ji bona welatên din 2 lîreyên inglîzî. Bihayê Hejmarekê: 10 Qemert.

Dîwan û gerîndekariya Rojnamê: Bêrût-Birc; Weqîf Tabet, Telefona Dîwanê: 74-04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Rojanû.

KWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

CENG & SIYASET DEWRAN

Cihan, piraniya mîletên dinyayê, ji nû ve baweriya xwe bi Xwedê tînin, dellîlê vê baweriyê eve ko qîma xwe bi heq û bi azahî û serbestiya cihanê tînin û bi heq û serbestiya mîletên cihanê qail dibin. Xwedê heq û edalet, serbestî û azahî ye, her tiştê pak û qenc, her tiştê bilind û heja ji kerema Xwedê ye, û ew tiştên he, bi qencî û raezinahiya Xwedê ve, girêdayî ne û mensûb û aidê wî ne. Di qiyametê de canet, bibûst, para mirovên qenc e yên ko li dinyayê bindestiya emrên Xwedê kirine û bikêrî nefsê xwe, welat û mîletê xwe hatine. cehenem, dojeh, zêdana mirovên xerab e, mirovên tiral û tembel bê bext û mîfsid, mirovên ne bikêrhatî mirovên ko xidmêta dîn û dinya xwe ne kirine. Xwedê ji kerema xwe li dinyayê jî, rîya canet û cehenemê pêş me kiriye. Di dinyayê de ji bona mîletek, xwediyê erdê xwe bûn, lê de serbest û aza rûniştin, îqê xwe, îqê welatê xwe bi destê xwe gerandin, mîna siha cehenemê. U dîsa ji bona mîletek dîl û hestrketin, destê biyanîyan de, seflî û gerpeze man, ne siha cehenemê lê rast bi rast mîna agirê dojehê ê dijwar, xerab, û cegerûz, e. Ji xwe welê ne biwa, mîletên mezin, mîletên egîd û mêrxas, bi qesada parastina welatê xwe, azahî û serbestiya welatê xwe, li rêşayîyê li ser rû û binê avê û bi hewa re gerê dijminan ne dikirin, xwe ne didan kuştin. Pêxemberê Xwedê bi xwe, cenabê Mihemed— silav û rehmeta Xwedê lê be— ji bona parastina dîn û diyanetê çend caran ger kiriye. Se bir û dia besî parastin û kênanandina neyaran biwa, pêxemberê Xwedê, destê xwe ne diavêt qûrê xwe û wî bi xwe singê xwe ne dida neyaran. Pêxemberê me ji wan mirovên xwedî sebir hezdikir ko ew deh bûn dijminên wan sed, û ew deh bi sebir û mîraniya xwe çavê dijminan di kênanandin û ew bi gûnda vedigeran din. Pêxemberê me şanî me kiriye mîletek bi çî awayî dikare bigehe heq û mezinahiya xwe, û mîletên cihanê ên egîd û ciwanmêr jî berevanî û parastina heq çilo dibe, pêş me dikin.

Bixebite û dia bike ko Xwedê ji rehma xwe qesda te bibe serî, gava dibînî ko xebat zehmet e, sebir bike û bizane ko Xwedê ji mirovên ko di pêşiya îqên giran de sebir dikin, hez dike.

Îro dijminê me ê xedar û mezin nezani ye, ji perîşaniya kurdan ye ko berpirsiyar e ez, im û tu f. Rasîf eve, de bêje belê. Heke ez û tu, em qail bûn ko dijminê min û te ê mezinîr nezani ye û beke min û te me dest bi xebatê kir, emê zora ve nezaniyê bibin.

Ew hût û ejdehar ji min û te ne xurtir e, gir xuya dike hûr e,

ENIYA BEHRA SPI

CEZAYIR — Qerargeha Hevalbenda a mezin li eniya Behra Spî dide zanin: Eskerên britanî yên Ordiya pêncan di qada Anziyoyê de, bi serdestî êrîşî dijmina kirine. Di eniya Ordiya pêncan a bingehîn de, qiwetên emerîkanî di Kasinoyê de, bi xurtî zor dane elemana. Di derên din de tevdana kewte û sedmêran dom kirine. Refên me, di eniya Anziyoyê û Kasinoyê de, kom esker û girgîrokên dijmina bi xurtî bombardîman kirine.

Bombeavêjên me ên sivik û neçîrvanên me, di ser qada şerî re firiyane, karê xwe ê dîdevaniyê pêk anîne û tim û daim dijminê şandine. 4 balafirên dijmina hatine xistin erdê, 2 mekîneyên me, venegeriyane warên xwe. Qiwetên me ên hewayî yên eniya Behra spî 800 caran bi hewa ketine.

ORDIYA SOR LUGA STANDIYE

MOSKÛ— Siwarî û tangên rûsî piştî êrîşke xurt Luga standiye, û dane pey eskerên elemana û gihane dera ko ji Pskovê, bitenê 30 mil dûr e. Pêşmêrên Ordiya Sor rêhesina Luga—Pskovê vegirtiye.

STOKHOLM— Hawîrên setahiyetdar bawer dikin ko mirov-dewletêkî fenlandî, Paştîkî, yê ko hatiye payetextê Şweçistanê, tekkîfên Fenlandiyê ên silhê qedimandine hikûmeta Sovyetistanê; her çend jî ew bi xwe hêj ne çûye niminendekariya sovyetî a Stokholmê.

LONDRE— Balafirên elemanî dirêjî axa Brîtanya Mezin kirine, 6 hebên wan hatine avêtin erdê. Ji aliyê din neçîrvanên britanî bi ser peravên Fransê re du mekîneyên elemanî anîne xwar.

Qerargeha Hevalbendan li eniya Behra Spî dide zanin: Di eniya Ordiya pêncan de qiwetên emerîkanî êrîşî Kasinoyê dikin. Di serîra Anziyoyê de, leşkerên Hevalbenda çeper û penahên xwe qaim kirine. Bombeavêjên me ên navhincî dirêjî destgehê emendederên Vi terboyê kirine û li gazxaneyên Livurnê xistine. Di axa Çisternayê de refên me bi serfirazî komeskerên dijmina û zad û zexîre û çek û posatên di wan, dane ber agirê xwe.

Neçîrvanên me ên bombeavêjî di erdê piştçeperên dijmina de bi ser hêjgehên neyara ên eskerî de girtine û lêdane. Neçîrvanên me bi ser qada şerî Anziyoyê re firiyane, karê xwe ê nobetdarî û dîdevaniyê pêk anîne û gelek ber-êrîşên dijmina bi serdestî paş ve zivirandine. Duha 24 balafirên dijmina û du mekîneyên wan ên dîn hatine xistin erdê, 5 balafirên me venegeriyane warên xwe. Li 4-ê şîhatê, 4 mekîneyên dijmin ên din jî, hati bûn xistin erdê, lê danezana me qala wan ne kiri bû.

BER BI LETONYAYÊ VE

MOSKÛ— Cengê axa Letonya û xelîca Fenlandiyayê di nîzîkî Pskovê de, bi awakî zor û xwindar destpê kiriye. Eleman bê etlahî qiwetine teze diqînin ve eniya şerî. Yekîneyên Ordiya Sor Korsum vegirtiye

xurt xuya dike sist e, dijwar xuya dike, pepûk e. Ez û tu em dizanin ko mîletê me mîletekî heja ye, ez û tu em dizanin ko mîletê me, ne kêml tu mîletên dinyayê ye, ez û tu em dizanin ko peyayên ko ji nav mîletê me rabûne, bi qasî mirovên dinyayê ên qedir-giran, bi qîmet in

Mirov divê ji welatê xwe hez bike, ev emrê Xwedê û pêxember e. Mirov divê ji bona mîlet û welatê xwe bixebite, ev jî emrê Xwedê û pêxember e.

Divê em dest bi xebatê bikin, tiştên ko min û te heta îro kirine, baş in lê ne bes in, bi rastî ne bes in, kêml û hindik in, xweş bizane gelek hindik in.

Gisîne xebatê min û te divê xetîne hêj kurtir rakin.

Min û te, me baweriya xwe bi Xwedê û bi welatê xwe aniyê, heke pêxemberê Xwedê bê xebat, bê şer û teşxele nikarî bû bigehe armanca xwe, em evd û xulamên di wî, bê xebat û xeyret, bêqî nikarin xwe ji perîşanî û seflîyê xelas bikin

Heke dikarî zimanê xwe bixwînl û binivîsl, kurdekî peyda bike û wî hînl xwendin û nivîsandina zimanê xwe bikî. Mîna terkiserên dinya ye bibe derweş, di nav gundan de bigere, darsa xelkê bibêje, xortên

inglîzî û emerîkanî û rûsî di nav berf û baranê de ev çar sal in ger-dikin, xortên frensîz jî erdê Fransê Vegirtî baxdîdan, xwe digehînin Efrîqayê, dibin esker û diçin Italyayê şerê elemana dikin.

Polonî, Çek, Yewnan, Sirb Holendî, Belçîkî jî ev pênc sal in di meydana şerî de ne. Dinya şev e, şev tarî ye, ba liba dibe, berf û baran dadikeve badev rabûyê, xortên cihanê dikevin balafirên xwe, di nav mij û dumanê de çar aliyên xwe xweş na binin bi hezaran kilomêtiran difirin, tèn agir dibartînin bajarên neyaran xwe.

Neyarê wan ne pepûk û tîrsonêk in, bi neçîrvanî riya wan digirin, bi gulleyn topên xwe ên balafirîken zor didine wan, wan diqînin. Şevî hene 30—40 bombeavêjî dikevin erdê, balafivanên lê de tevî balafirên xwe tene gewitandin.

Şevêk diçe, geveke din tê, xortên heja ji nû ve li balafirên xwe siwar dibin, û di tariya şevê de bi hewa dikevin, û berê xwe didin erdê dijminên xwe...

Bihayê azahî û serbestiyê xebat û xwîn e. Bê şik kurd jî mîr in, û kurd jî bi hezaran di ser riya welatê xwe de mirine!

Lê ez qatî halê xwe û yê te dikim,

Xesarên Bomban

LONDRE— Meha borî bi êrîşên hewayî di Englîzîtanê de, 107 peya hatine kuştin û 270 heb jî brîndar bûne.

NO— DELHÎ— Di rohelat û rowayê çiyayên Maguyê de, di nav bira qiwetên britanî û japonî şer dom dike.

XORTEK



Ji taxa Kurdan a Şamê

MELBÛRN— Qiwetên Hevalbendan ên rêşayîyê girava Rûke di pengava Vitiazê de, vegirtiye. Refên hevalbendan li zehf hêjgehên û nezame di Rabatê de li sê balafirgehên xistine.

Xesarên ko gihane dijmina zehf giran in. Di tengava Sen Corcê de, derbên Hevalbendan li gemiyeke japonî ketine.

CIWANÊK



Ji xortên me yên Kurdistana Iraqê

LONDRE— Duha êvarê Radyoa Romayê elam dida ko leşkerên emerîkanî bi nav erdê bakur rohelatê kasinoyê de gelek paş ve çûne.

LONDRE— Duha refêkî frensîzî tevî refên bombeavêjên Boston dirêjî hêjgehên axa Germanîstanê kirine.

LONDRE— Tête gotin, ko nivîseva nê frensîz ê bi nav û deng, Tristan Bernard, di Nîsê de hatîye girtin

DEMA NIHA

BOMBARDIMANA BERLINÊ

LONDRE— Şevadî Berlin bi awakî heta niha çênebûyî, hatiye bombardiman kirin. Hezar balafirên britanî êrişî hêjagehên payêtextê elemana kirine û 2.600 ton bombe berdane; êriş 20 teqîqan ajotîye. Refên britanî, jê pê ve li bajarê elemanî Frankfurt li ser Oderê xistine. Piştî ko hezar balafirên britanî Berlin dane ber bomban û jê bi dût ketine, bombeavêjen Muskitos bi ser vî şaristanê de girtine û ji nû ve bombe avêtine. Xesarên çêbûyî gelek dijwar in, şewatên ko bi wan bombardimanan çêbûne hêj dom dikin. Dancana elemanî bi xwe muqir tê ko êrişê çekê britanî tîr tîrs û dehşet bû.

STARAYA RUSA KETIYE

MOSKÛ— Ordiya Sor Staraya—Rusa û Şmînsk vegertine. Der enişka Dnieprê neh firçeyên elemanî ko dora wan hati bûn girtin, bi destê eskerên sovyetî hatine saff kirin. Yekîneyên rûsî ji nû ve û bi awakî xurt êrişî Krivoy—Rogê dikin.

Serdestiya Qiwetên Hevalbendan

LONDRE— Ev 48 saet in qiwetên elemanî, bi qesda avêtina eskerên Hevalbendan behrê dirêjî serpira Anziyoyê dikin. Hemî êrişên elemanî hatine paş ve zivirandin.

LONDRE— Di nav çar mehên dawîn de li Polonyayê, elemana 6.000 welatperwerên polonî dane ber tîfingan.

Strana Kurdi

HA WER DELAL

Ha wer delal, ha wer delal.
Emîno kuro, min û li çema çemê Bişêriyê:

Mi li Ferata, li Feratê Ehmedîyê, Kelekvana, kelek berdan dût gemiyê; Zewac xweş e li zozana li koçeriyê.

Mi xanimê mi cindiyê, mi Remziye xanim keça apê Emer Begê, qîza Mîrê Muhaciriyê;

Emîno kuro, tu şevkê were mala bavê mi mêvaniyê: Tu were tewafa cotê memikê mi zeriyê;

Ji te ra pir xweştir e, ji axatiya Remaniyê.

Mi Emînê Ehmed bavê Şukrî siwarê Sîqal axakê Rema dî bû li çawirma Mûşê, ser kursiyê.

Kolosê kiver xwar kir, kir mêvanê vê koffiyê:

Xwedê bi qedanda miradê mirad xwaza, bira biba miradê min û Emînê Ehmed, bavê Şukrî, siwarê Sîqal, axakê Rema;

Ezê bi bama darê nav çavê wê hewiyê:

Ha wer delal, ha wer delal, wer delalê;

Emîno, kuro min û li çema çemê Eynebetê.

Fermana min û Emînê Ehmed, bavê Şukrî, siwarê Sîqal axakê Rema rabû ji cem Kemal li çim-hûretê;

Na welle rabû ji Diyarbekir ji ba qol-ordî ji wilayetê,

Emîno, kuro mēzeke, xelk û alem bûne tabûr li pê me tē;

Emîno, kuro were mi bi revî ne, bavî Amûda Mîra, binya xetê xwezî bi çaxa Xwedê bi wê saetê

Ha wer delal, wer delalî;

Emîno, silav hatî ser silavê, mi ji Hillana zêwê kiri bû qutya dev ziravê,

Mi şand mesla jorîn koşka navê, zemanê berê xweş zeman bû, bi emrê birê, bi qailya bavê, qeda were li şurûta vî zemanî;

Heta dilê dê ne, kevê qîzê nadê;

Ha wer delal, wer delalî, Emîno, kuro, Cizra Bota bi darkevot in, du xerat ketinê dar verot in,

Mi dî du Kevokan bi hev ra xwendin, du bilbila tevde gotin, xwezî bi rehma Xwedê, bi wê wextê bira mi bidîya serê min û Emînê Ehmed bavê Şukrî siwarê Sîqal, axakê Rema, her du li ser ba'îffê bûne cot in.

Ha wer delal, wer delalî.

Emîno kuro textê seyida ser ber jê e, Hillana zêwê bi ser da mil e

Koşka navê, hebki li hêl e, mi dî Emînê Ehmed bavê Şukrî siwar bû, li hespê nêr e;

Berê xwe da Amûda Mîra ser ber jê e.

Emîno, kuro, mi go belkî tu pir ciwamêr î, mi nizanî bû tu ji wesayeta, wesîla jina xwe ne wêrî.

Bi anê welle, ez Teyfo nakim, tu derda li canê xwe pê da na kim.

Ezê Bişêriya jorîn bi deman kim, ava gola Sînanê li ortê kar kim,

Xwedê qadir kî, pir mezin e, belkî em sed û yek zêrî lîra tē da kar kin;

Ezê herim çawurma Mûşê, kurk û ebakê ji Emînê Ehmed ra bazar kim;

Pê şal û şapikê wî qeytan kim, belkî xerçiyek ji ber bîmfne, pê simelê wî hina kim;

Ezê serê Teyfokê muhacir bi qurban kim;

Ha wer delal, wer delalî;

Emîno, kuro, ez li zîn î, tu li zîn î, xwezî bibama nanekî ji nanê şekir hûr şulhîfî, tē ketama li ser dev û Emînê Ehmed, bavê Şukrî, siwarê Sîqal, axakê Rema, ji bo xatirê dükê qalûnê li xwerînî.


EBDILHADÎ MIHEMED

M. KOLONEL BUASO



Esker û nivîsevanî Reja Kolonel Buaso yê ko li Bêrûtê, cihgirtiyê serekê şerdariya Ordiya Frensîzî li Welatên Rohelafî bû, çûye Cezayirê ji bona karekî hêj bilindtir. Mirovên ko ew nas kirine, ji dil qedrê wî digirtin, ji ber ko ew zana, mērxas, ciwanmêr, û bi her awayî hêja û guzîde bû. Benda Roja Nû a pêşîn, ya birê frensîzî çîreyê qelema wî bû û wî di wê bendê de pesnê edebiyata kurdî dida û wesfê mezinahiya miletê kurdî dikir. Kolonel Buaso tu cara jî bîra me naçe û daxwaza me xweşî û serfiraziya wî ye.

IBADETGEHEK



Ji bergehên welatê Frensê ên spehî û çeleng: Miletên dinyayê hemî muhtacî dîn û diyanetê ne. Dîn, heq, exlaq, rastî, qencî, xebat û paqîjiya dîl û wîcdanê ye. Dîn û bawerî mîletên dinyayê ji tarîtiya nezanîyê xelas dikin û wan digehîne ronîya Xwedê.

Heçî ji Xwedê hez dikin, ji zanîyê, ji pêşveçûnê hez dikin. Bitenê ilm û zanîyê mirovan digihîne ntzingî Xwedê. Heke dîl û çavê me bi zanîyê qenc venebûne, em nikarin bi rastî mezinahiya Xwedê nas bikin.

LE JOUR NOUVEAU

Direction: Beyrouth Wafk Tabet
Place des Canons Tél. 74-04 et 84-41

QUOTIDIEN KURDE
Directeur - Propriétaire: EMIR DR. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 10 P.L.S. - Abonnement
Syrie-Liban 10 L.L.S. Etranger 2 L. Stg.

Vers la Victoire

CHRONIQUE HEBDOMADAIRE
DE LA GUERRE

Volant de victoire en victoire, l'Armée Rouge frappe alternativement au Nord et au Sud et sème la panique dans le Haut Commandement de la Wehrmacht et dans l'esprit de Hitler. Le « Grand Caporal » ne parle plus d'une victoire allemande. Ce rêve a vécu. Maintenant, les Nazis ne pensent qu'à une seule chose : retarder leur disparition. Mais personne ne pourra arrêter les Soviétiques dans leur marche victorieuse sur Berlin.

Suivant les instructions du Maréchal Staline, les vaillantes troupes des 1er et 11ème fronts ukrainiens avaient encerclé 10 divisions allemandes à l'Ouest de Tcherkassy, le 3 Février dernier. Les violents combats pour l'arrêt de ces divisions ont pris fin maintenant. Von Manstein a mis en ligne toutes ses réserves disponibles, pour secourir les troupes encerclées, mais il n'a pu qu'aggraver le désastre. Cette bataille a coûté à Hitler la perte définitive de près de 100,000 soldats et d'un matériel pouvant équiper un Corps d'Armée entier.

C'est la plus grande catastrophe subie par la Wehrmacht depuis Stalingrad. Depuis cette bataille mémorable, la Wehrmacht n'a pas cessé de reculer. Mais dans sa propagande, Goebbels soulignait inlassablement que par cette tactique « de défense élastique », les troupes allemandes abandonnaient du terrain à seule fin de raccourcir leurs lignes et sans subir de pertes.

Or, en définitive, cette « élasticité » allemande a abouti à la disparition d'une grande armée allemande, alors que la ligne du front s'est allongée de plusieurs centaines de kilomètres depuis un an.

Les victoires remportées par l'Armée Rouge tout au long du Front Oriental sèment la terreur dans les pays satellites de l'Axe. Hongrie, Roumanie et Bulgarie d'une part, et la Finlande de l'autre vivent des jours sombres.

Le Gouvernement Hongrois veut persuader au monde qu'il n'est pas solidaire de l'Allemagne et que celle-ci poursuit une politique indépendante. On se rappelle que le Gouvernement de Budapest avait commencé par démentir la présence de troupes hongroises sur le Front Oriental et que Moscou avait rétabli la vérité en citant les unités qui s'y trouvent toujours. Maintenant, l'Etat-Major Hongrois a fait des démarches répétées auprès du Grand Quartier Général Allemand pour obtenir le rapatriement immédiat des divisions hongroises. Hitler y a opposé une brutale fin de non-recevoir.

Quant aux Roumains, si courageux hier, mais devenus maintenant singulièrement poltrons, ils fuient la Bessarabie et la Moldavie. Pris de terreur, le Gouvernement de Bucarest prend des mesures en prévision d'une invasion soviétique.

C'est en Bulgarie que la crise est la plus aigüe. Le gouvernement pro-allemand est aux prises avec l'écrasante majorité du peuple, dont les sentiments panslaves s'intensifient par suite de l'avance russe. Constamment, des bagarres se produisent entre patriotes et policiers. Pour maintenir son autorité chancelante, le gouvernement de Sofia vient de créer une police spéciale sur le modèle de la Gestapo et de proclamer le couvre feu sur toute l'étendue du pays.

La Finlande, elle, semble se rendre compte pour la première fois de sa situation réelle. Ce changement d'attitude est survenu à la

KURDISTAN A PROPOS D'UN ARTICLE

Dans notre dernier numéro, nous avons publié la traduction intégrale d'un article sur le Kurdistan qui vient de paraître dans la revue égyptienne « Akhbar el Harb ». Il appartient à notre journal de préciser la portée de cet article.

Nous ne songeons pas à aborder ici le vaste domaine de l'histoire, de la culture, de la vie économique des huit ou neuf millions de Kurdes qui, comme le précise l'« Akhbar el Harb » — habitent un triangle montagneux situé dans les territoires turc, iraquien et iranien. Ce que nous voulons, c'est rappeler les circonstances à la faveur desquelles les Kurdes de Syrie, d'Iraq et d'U.R.S.S. ont pu développer leur culture propre et exprimer leurs sentiments nationaux, malgré le morcellement politique auquel l'« Akhbar el Harb » fait allusion. Le rappeler c'est, on le verra, payer une dette de reconnaissance à la France, à la Grande Bretagne, à l'URSS.

La victoire alliée de 1918 constituait le triomphe des principes dont l'application a rendu la liberté aux Tchèques, aux Polonais, aux Arabes. Dans le domaine théorique, ces principes ont fait admettre les revendications kurdes tendant à l'unité et à la souveraineté nationale ; dans le domaine pratique, l'application du traité international qui sanctionnait ces revendications, a du céder aux jeux de facteurs imprévus. Toutefois, l'esprit même de ces principes a survécu aux vicissitudes des contingences politiques.

La Société des Nations — qui garantissait, dans tous les pays sous son contrôle, les droits des minorités ethniques — confiait les mandats syrien et iraquien à la France et à la Grande-Bretagne. Ces deux puissances ont fait honneur à leurs obligations vis-à-vis des minorités.

En U.R.S.S., les Kurdes ont bénéficié de l'encouragement que les autorités accordent au développement culturel na-

ALGER. — Les dernières dépêches parvenues du front d'Italie annoncent que les contre-attaques alliées dans le secteur de Carroceto font des progrès

tionnel de chacun des peuples de l'Union Soviétique, bien que le nombre de Kurdes en territoire soviétique ne dépasse pas 160.000. Après la première guerre mondiale, tous les peuples du Moyen-Orient jouissaient d'une liberté et d'une prospérité qu'ils avaient ignorées depuis des siècles. C'est ainsi que, dans le Kurdistan d'Iraq, dans le Nord de la Syrie et en pays soviétique, un million et demi de Kurdes ont connu une magnifique renaissance nationale.

Sous la protection des autorités soviétiques, françaises et anglaises, les qualités si solides des Kurdes se sont épanouies. Tandis que le labeur paisible du paysan et de l'ouvrier kurdes répandait la prospérité matérielle et que des écoles kurdes s'ouvraient un peu partout une nouvelle littérature populaire se développait.

Avant 1919, la langue littéraire kurde — très différente de la langue parlée, comme c'est le cas pour le grec classique ou pour l'arabe coranique — était mal comprise de la grande masse. Pour l'écrire, on se servait de l'alphabet arabe. En 1919, les bases d'un alphabet kurde à caractères latins étaient jetées, sur le conseil d'éminents orientalistes européens. Cet alphabet, bien adapté au caractère indo-européen de la langue kurde, joint à l'usage du langage populaire, a permis l'éclosion d'une vaste littérature populaire.

Des centaines de livres en langue kurde, de nombreuses publications, dont dix périodiques, répandent, parmi les Kurdes de toutes les classes, l'esprit vivant de leur culture nationale.

Quand, après cette guerre, les Nations-Unies régleront les destinées des peuples, il sera intéressant de voir de quelle manière les principes de la Charte de l'Atlantique, et ceux qui s'expriment dans les déclarations du gouvernement soviétique, influenceront le sort du Kurdistan.

Depuis plusieurs jours, des négociateurs finlandais se trouvent dans la capitale suédoise pour établir le contact avec les Soviets, et pour connaître les conditions qu'ils poseront. Ces conditions n'ont pas encore été révélées. Il est clair, toutefois que Moscou exigera la disparition des hommes d'Etat d'Helsinki qui ont entraîné le pays dans la guerre contre l'URSS. Cette demande semble être considérée sérieusement par Helsinki, puisque le Premier Ministre finlandais aurait démissionné.

WILLIAM SHAKESPEARE

C'est sous le règne de la Reine Elisabeth que vécut le plus grand poète anglais, celui qui connut la misère des pauvres et l'amitié des grands, et qui sut voir, du regard pénétrant et clair du génie, la part d'humanité et la part de rêve que chacun porte en lui-même.

Dans cette période de guerre intérieure et extérieure, le pays prit un développement sans précédent, et vivant à Londres, Shakespeare connut sans doute les capitales des frégates chargées d'étranges trésors, les soldats de fortune, les gentilshommes campagnards, les doux mendians et les criminels endurcis que produit une époque d'aussi profonds changements.

Mais où a-t-il pu connaître ces êtres légers, fantasques et charmants qui donnent tant de grâce à sa Tempête, à son Songe d'une Nuit d'Été, à son Conte d'Hiver ? Comment a-t-il conçu cette Titania capricieuse et fière, ce Puck maucieux, ce Caliban lourdaud, et toute la farandole de ces créations de songe, fées, esprits, sorcières, qui nous font rire et pleurer quand nous les voyons pour la première fois, et que nous n'oublierons jamais plus.

Car ce que Shakespeare a d'unique dans la littérature du monde, c'est qu'il enrichit notre vie de toute une série d'amis, aussi réels que ceux qui nous aident dans notre travail et dans nos plaisirs. Qui de nous n'a pensé à la tendre Ophélie ou au fougueux Roiwe combatu, et qu'un qu'il aurait connu dans quelque mystérieuse existence antérieure ? Qui de nous n'a frémi devant l'horreur du Roi Lear ? Qui de nous n'a tremblé devant l'angoisse d'Hamlet ?

Comme la vie, les drames de Shakespeare sont entremêlés de traits burlesques et sombres : les valets ironiques et les fous trop sages interviennent dans les plus sanglantes tragédies, comme pour nous faire comprendre que ce qui peut arriver de plus terrible à un être ne concerne que lui seul, isolé qu'il est dans sa vie fragile et unique. Et ce que sa période eut de sombre et de magnifique, Shakespeare en a fait comme un tableau rehaussé d'or et de pourpre, sur un fond de sombre mélancolie, de l'angoisse et du triomphe de la condition humaine.

Chacun connaît ses drames ; on connaît moins ses poésies, qui sont pourtant l'une des merveilles de la littérature, surtout ces étranges Sonnets qui racontent la mystérieuse histoire de deux hommes et d'une femme, et dont tant de critiques ont cherché à percer l'énigme, comme si une telle solution pouvait ajouter à tant de perfection, à tant de désespoir.

Car dans ces poèmes comme dans tout ce qu'il écrit, Shakespeare a mis comme une goutte d'éternel, et les mots d'amour qu'il murmure tout doucement un soir d'insouciance, résonnent à nos oreilles avec le bruissement du vent qui plie les arbres de notre jardin ; comme lui, ils sont les mêmes chaque printemps, et tout autres pourtant avec chaque jour qui passe.

L. V.

LA PRESSE KURDE

Nous signalons, à nos lecteurs s'intéressant au mouvement culturel KURDE, les journaux et périodiques kurdes suivants :

RIYA TAZÉ, organe des Kurdes de l'U.R.S.S. paraissant à Eriwan.

GALAWÉJ, la plus grande revue littéraire kurde, paraît chaque mois à Bagdad, avec 80 à 100 pages de texte hebdomadaire politique et littéraire paraissant à Baoua maré.

JITAN, revue littéraire bi-mensuelle paraissant à Damas. Textes arabes et français.

HAWAR, revue mensuelle illustrée, paraissant à Damas.

RONARI, Revue mensuelle illustrée, paraissant à Damas.

K. B.

Çiroka Kurdî

MUHRA SULEYMAN

Ji ERMEXANI RE ERMEXAN

Şairê meytî mezîni «Cezîrî»
çiqas rast û çiqas xweş gotiye:
«Kesê xurbet nedî, mih-
net ne xwarî cur'eya firqê.»
«Çi zanî, bêxeber jana,
dilê dax û keser tê da?»
«Brûska hatîni da dil, fe-
lek ez pir hilavêt im.»
«Nizanim, hêj kuda ba-
vêj, divê dewran û çerxê da?»
Ah, seydayê min! xwezî ew
qudreta te ya girê bi min re
heba û min fro pêt û guriya
agirê dilê xwe teswir, bikira,
xwezî...

Çiqas tişteki bê mane ye,
ku hezar çiya û şorezarî der-
basbi kim, ji hezar deşt û
nevalî bi bihurim, û paşê bêm
li ciheki mîna vî cihi rûnim;
têde gula xortaniyê bi çilmisî-
nim mûma çiwaniyê vemirîm-
im, û şireya mejiyê xwe, bi
zarokên «Zêd û Umer» an,
bidim vexwarin!

Di «Rojên derbasbûyî» de,
min, sebeb û hikmeta vê sirê
nivîstî ye. fro naxwazim dîsa
lê vegerim ..

ooo

Iro, piştî dahne nîvro
gava min zarokê dibistana xwe
belav kirin, min xwest, hebekî
derkevîm dora gund, bîna xwe
ya tengîji bistînim. Hêdî, hêdî
bi rêve diçûm, û min li dora
xwe dinêrî. Li kuderê min çav-
endayî (menzere) yek çak di
dît, li wê vardiçûm, û min
bi ah û keser lê dinêrî. Welatê
min fî kesek dihate bîra min...
ew çiyayên reng-zirêç li ber
çavê min derbas dibûn. Bê
vîn, bi rêve diçûm... nizanim
çawa bû, ji nişka ve, lingê
min bi tişteki ve aliqî. Gava
min bala xwe dayê, veciniçûm...
û bi şûnde vekîçiyam. Ev tişt,
di çeklê kuvarkekê de bû. Lê
ne kevir, ne hesin, ne dar û,
ne jî giya bû.

Bi rengê xwe jî, ne mîna
tu rengê ku em dizanin. Cîsmê-
kî xerîb, bi rengêki ecêb bû.

Belê, gava min bala xwe
dayê ez veciniçûm. Çima ku
her car em dibihîzin, yan jî
di rojnameyan de, dixwînin
ku li filan ef, yan li filan derê,
merivekî tişteki li erdê dîtîye,
paşê di destê wî de teqîya ye,
û ew kuştîye, yan jî birîn-
kiriye.

Ez çî bizanim, di cenga
fro de, erd û ezman û derya
giş hatine lexemkirin. Bi vê
tîrsê, gava min ew tişt dît,
min got qey bomba, yan lex-
mek e. Her carekê min lê
dinêrî, min gavek bi şûnde
davêt. Di wê gavê de, min
fam kir, ku can çiqas şerîni e.
Lê paşê, ez qederekî damam.

Ew canê ku li «Cidêda Ertûz»,
bê fêde û bê sebeb diriz e, çî
xêra, wî heye? Min ji xwe re
go hema çidibe, bira bibe,
min destê xwe dirêjî wî tiştî
kir; min ew jî erdê rakir û di
nav destê xwe de peland.
Hingî, ji mûyê serê min hetanî
serê neynûkê lingê min de şîp
«cerayan» ên kebrebî çûn û
hatin... dinya li ber çavê min
bû mij û xamam... paşê hêdî
hêdî ew mij wenda bû, li çûna

wê, du dêwên reş, qûr bi dest,
xuya bûn, û ji min pîrstin:

—Em dinê xan bikin, xerabe
bikin?

Di nav çirokan de, min
efsaneyên wisan bihîstî bûn:
lê rojek ji rojan, ne dihate
bîra min, ku efsaneyok wisan
bê serê min bi xwe, û bi ras-
tiyeke bê gûman, li ber çavê
min xuya bike... Bi rastî jî ber
vê rast—hatina ecêb ez rast û
çep teyîstîm... Paşê min xwe
girt. Berî ku caba dêwan bidim
min ji wan pîrs kir:

—Ev çiyê, di destê min
de ye?

Gotin: Muhra Suleyman e,
Em dinê xan bikin, xerab bi-
kin?»

—Na!... Ez, ji we hêvî
dikim, nûba bîra dunya mîna
xwe bimîne, kanî cenabê
Suleyman li kuye?

Her yekî ji wan, bi destê
min girtin, û gotin: Çavê xwe
bigre... Hetanî min, çavê xwe
girt û vekir, min xwe di hizûra
Suleyman pêxember, padîşahê
îas û cinan de, dît. Li ser
textekî zêrîn rûniştî bû... li
hemberê wî «Belqîz» jipiya
bûn, di destê wê de piyanek
kewser hebû... pêşqêşî pîres-
teşkarê xwe dikir, Wî jî, di
lop—dilop bi ser xwe, da oi-
kir. Paşê li min zivirî û got:
—Ev bûn du hezar sal, cinekî
bi navê «Seydo», ew muhira
min ji min dizî bû. Vaye, fro
te ji min re anî; Te çî divê, ji
min bi xwaze...

Min dizanî bû, Suleyman
pêxember padîşahê teba (hey-
wan) ne, di dinê de, zman û
zaravê teban, ji min re bûbû
mêraq. Min jê re go: Hêviya
min ji cenabê te, mifta baxçê
teban û tilîsima zar û zmanê
wan e...

Cenabê pêxember, ev tişt
min dirix ne kir; ji cinekî re
ferman kir, ji min re daxwaza
min anî... Ez çûm nav baxçê
teban... Ji her çêşidî teba ref-
ref difiriyan... kerî—kerî dige-
riyan. Ez bi gelekê wan re
peyivim; Ji hinekan dilxweş
ji hinekan jî dilreş veqetiyam.
Dilê min bi hinekan şewitî
mîna berx, ga û klvropkan...
Li hinekan jî hatim xezabê wek
mar, topîşk, gurê dev-bi xwîn
û kaselsê wan (çeçel û rovi).

Cenabê pêxember, wê rojê
destûra min ne da. Çima ku
roja dûtir muhakema kund û
goyin (pepûk) hebû... ji min re
go: divê tu, vê muhakemê jî
bibînî. Ez jî mam.


Wexta muhakemê hat
kund û pepûk li ser kursiya
fîlhamê û li kêleka hev rûniştin.
Suleyman pêxember ji kund
re go: Teba giş, ji te giş û
û gazîna dikî; Dibêjin: «Ev
tebaki şûm û hêxêr e... li ser
kê dixwîne, mala wan kambax
dike» tu çî dibêje? Kondê ser-
mezîni û çav-zer (ku jî xuya
dikir, perêkî ji zadeganiya xwe
feda nake) bi giranî rabû ser
xwe û go: Şahê min, tu guh
didî kurm û kêzikê zeviyani...
Ji bav û kalan de ew necîra
me ne... gêrik û mûrî jî kole-

Civanên Dîroka Cihanê


Serekên Hevalbendan ên Mezin, di Qahire, Mosku, û Tehranê de civanîne
mezîni danî bûn û lê de şewir û mişawirên giran çêbûbûn.
Wêneyên jêrîn çend bergehên wan civanan pêş me dikin.



Civanê Qahirê: Serekwezîr Çorçîl, Serekcîmhûr Rûzvelt, û Serekcîmhûrê Çînê Mareşal Çang Key Çek



Civanê Tehranê: Mareşal Stalîn, wezîrê Britanê ê yekemîn Mr. Çorçîl û Serekcîmhûrê Emerîkayê Mr. Rûzvelt



Ji Bergehên Sovyetîstanê, keç û dotên Sovyetîstanê di dibistanan de hînf zanînine heja dibin û bi her awayî bi kêrî mîlet û welatê xwe tîni.

ye... ne hedê wan ku li
min gîlî bikin û bi min re
muhakeme bibin.
Wekîlê gêrik û mûriyan
emurê goyîn rabû ser xwe;
Çelîkê xwe — ew çelîkên ku
kund ew di helîna wan de
xwaribûn — anî bîra xwe, çend
dilopen xwînê ji nukilê wî
herîkin, û jî dil keserekî kişand
û got:
—Çavê xwe veke, esendîl
em tovê bablîska bîstan e... fro
bendegani û zadegani ne ma-
ye... her kes serbest û azad e.
vê fikra tawşî jî serê xwe bavê

je, bîra çavê te ronîya rojê
bibîne... ez fro, dawa xwîna
wan çelîkên bê guneh jî te
dikim...» Gufte—goyek dût û
dirêj, di nav her du mîrxan
de çêbû. Ez bi mîraq, li ben-
de hukmê cenabê hakim bûm...
lê muxabîlî giriyê kurê min fî
şesmehtî «mizgîn», ez jî xew
hişyar kirim.
Hingî, ji ser dîwarê xera-
bekî, dengê kundekî di hat...
di newaleke kûr û dûr de jî,
pepûkekê hezîni, hezîni di nali-
ya... Cîdê de: 27 — 10 — 943
QEDRÎ — CAN

LONDRE —
Nûçeyên dawîn
yê n Kasînoyê
elam didin ko
elemana bi çav-
sorî şer dikin
lê hê feyde. Jî
her alî qîwetên
Hevalbendan
zor didine wan
û dema perîş-
niya wan bin
bi hin nîzing-
tir dibê.